FANTEZIYA REXNEYÎ

PİŞKA -1

.Hoşeng Şêx Mihemed

Pêşekiyek perwerdeyî:

Tîweriya rexneyî:

Heger tîweriya rexneyî her ji Kant damezrêneyî rexneya eqlanî û heta Hegel, Marks û Engels qutabxana Firankfort, Firoyîd, Ferdînand Dî Sosêr, Foko, Horkhayîmer û nijyargerî piştî nijyargerî helweşîngerayî û çendîn metod û rêbazên cûrecûrên dî ku yek li dûv rexneya dî ava bûye. Vê çendê nîşan didin, ku felsefa nû bi taybetî dû sed salên dawiyê felsefeyeka rexneyî bûye "Kant 1724-1804" wek yekem feylesof ku peyrewa medodê rexneyî kiriye bo vekolîna arêşeyên felsefî, ya diyare jî metodê rexneya Kantî; "aqilî, wek wêneyek bo merifê ya karî werdigire" (1) binêre: Dr. Osman Emîn: mişkile el Hiriye fî felsefe Kant kovara el Hîlal berperê 54-68" bi nakokiyeka dî rexne vekolînê di aqlîde dike, yan wek; eqîl îdan, dibêje: felsefeya rexneyî li cem Kantî wate: rabûn bi vekolîneka rexneyî bo şiyan û ne şiyanên aqilê mirovî. "2" Eqil Îdan, el neqd û tesîs el eqlaniye/ el hîwar el mitmidin- jimara1509 roja 2/4/2006, bi ankoya aqilê mirovî heta kîj rade dişê bi kahînana metoda aqlanî û zanistî dişê di diyardeyên sirûştî yan metafizîk bigehin, çinkû ew di şiyanên aqilê mirovê de nîne bo wî jî Kantî daxwaz dikir mirov di diyardeyên fizîkî vekolîn û metafizîk jî bo piyawên dînî û ramanên metafizîk bihêlin bo wî jî digot: ***"Sinûrê zanistî li kî derê bi domahiyê bihên, sinûrê baweriyê li wê derê dest pê dike"***.

Hegel, 1770-1831:

Ku ew jî êke ji peyrewkerên felsefa rexneyî û li sala 1795-ê bi kargeriya şoreşa Firansî bo Şilingî dinivîse: ***"rêga çarê yê me aqil û azadiye"*** "3"-binêre Ramîn Cihan Bigilo, ramanî Hegelî çend waneyek li merfenomenolojiyayî rûh "diyardenasî zeyîn" wergêranî Îdrîs Şêx Şerîfî berperê 7-9" cem Hegelî bûye ku mirov xwe ji nama bûn, bi cîhanê rizgar bike, divê ji qonaxa felsefa rexnekirinê derbazbe û bi rêka xwe agehbûnê li cîhana dewrûberê

xwe, bişê li dûv azadiya mêjoyiya xwe bike, geryan li rizgarbûnê ji namûbûnê bi tine bi riya rawanînek felsefî û sîstematîk bo cîhanê peyda dibe, rawanîna sîstematîk bo cîhanê anku guhorîn û alogora çemkiyaneyiya cîhanê anku têgehiştin di çemka heqîqetê yan heqîqeta çemkê dizivîrîna diyardenasîneya cîhanê de "binêre hemû jêderê serî fenomolojiya rûh" Hegel di felsefa xwe da dîrok û siyaset û dîn û rêxistinên komelayetî rexne dike û dizane ku bi tinê aqil-agehî rêke çareye bê ku mirov ji got û peywendiyên lahotî û derebagayetî rizgar û reha be.

Marks 1818-1883:

Piştî Hegel Marks dihê û her bi metodê diyalektîkî rexna Hegelî dike. Heger li cem Hegelî agehî, biryarê li ser hebûna komelayetî dide yan egerê hebûna wî ye. Dîsan binêre aqil îdan el neqid û tesîs el eqlaniy, eve li cem Marksî "agehî" berhemê helûmercên dîrokî û madî û komelayetî ye. Çinkû mirov kurê wan helûmercaye ku tê de ji dayîk bûye. Ne wek ew helûmercan peyda dike. Ya diyare jî rexneya Marksî li ser komelgeha pîşesazî ya sermayedarî bû ku "mirov-kirîkar"î havî dike.

Niçe 1844-1900:

Êke ji wan feylesofên ku rexne veguheztiye ser rewşenbiriya rojavayî û bi dijwarî rewşenbiriya rojavayî di gelek layenan de rexne dike, bi rexnekî ku Nîçe heta vê gavê jî amadeyeka bi hêz heye di metodên nû yên rexneyên rojavayî de, Nîçe dihê û rexneyiya aqlaniyeta rojavayî dike ku Kant, Hegel, Marks û feylesofên dî di avakirina wî bi rengên cûda pişikdaran, li cem Nîçeyî aqlaniyeta rojavayî egerê ji navbirina xwe jî di gel xwe berhem hînaye û dûr nîne şaristaniyet û rewşenbiriya rojavayî tevrûtina bike. Nivîserê wan rêzikan basek taybet li dor Nîçeyî amade kiriye û destnivîse. Di vê derê de, di vê pêşekiya kurt de min nevêt gelek li ser Nîçeyî dirêj bikim. Lê Nîçe êke ji feylesofên ku bûye jêder bo gelek têwerên nû yên rexneyî, li rojava bi taybetî nijyargerî û helweşîngerî.

Nîçeyî dezgehên dewletê û komelgeha pîşesazî, sermayedarî û rewşenbiriya rojavayî bi giştî rexne kiriye û bi taybetî dîn û mesîhiyet anku Nîçe bi rexneyên xwe rûberû rewşenbiriya rojava bo meselayên wek metafizîkiya rojavayî û mesihiyet û dîn û çemka cewher û metafizikiya cewherî û heqîqeta mitayî û bingehên kontrola çemkgerayî di nav felsefê û sitatîkayê de û çemkxwazîmana û logosêntiralîzmiya ewropî."4" bo pitir pêzanîna binêre: pîrvîzîma helweşandinewegerayî, lêkoloneweyekî rexneyî, wergeranî: Rêyên Resûl Îsmail, bi taybetî berperên 34-41)

Qutabxana Firankfort:

Ku "Merîwan Wirya Qani di pertûka" felsefe û îslam û roşengerî, welamîk bo kitîbekê mele Bextiyar bi dirêjî behsê dîrok û çêbûn, kar, erk û pişikdarên vê qutabxaneyê dike" nivîserên qutabxana firankfort komeka rewşenbîrên çep bûn ku hijmarek tekstên rexneyî sebaret bi komelgeha rojavayê, kultur û sîstema sermayedarî nivîsî, di nivîsînên xwe de diviyan rokarên hizrî, saykolojî, komelayetî û meirîfî nîşan bidin ku hokarbûn bo bi hêzbûna faşîzm û nazîzm, her wesa ew bawerbûn ku rexna komelayetî, siyasî û felsefî dişê rolekî berçav bibîne di baştirkirina helûmarcên siyasî, komelayetî û saykolojiya vê cîhanê ku em tê de dijîn. Her wesa bawerbûn ku hizra rexneyî pêdivî nûkirinê ye, çinkû ew cîhana nû, ewên ew rexne dikin, cîhana sermayedariya sedê nûzdê û rojgarên Marks û Engels nîne, eve cîhaneke nûye. Helgirê pirsyar, arêşe, girift, mijde û hereşeyên nûye. Qutapxana Firankfortê bi kurtî xwendinek rexneyî bû, bo rehendên nû yên komelgeha sermayedarî û ew arêşeyên vî sîstemî berhem hênabûn. "5" "tikaye binêrên Merîwan Wiraya Qani felsefe û îslam û roşengerî berperê 133-144"

Formalîstên rûs, ku komelgeha vekoler û zana û lêzanên bi warên felolîna zimanvanî û filolojiya û mêjoya kulturî bûn. Di navbera salên 1916- 1930, diviyan rexneya edebî bi formek nû darêjneve û "zanista edebî" ber bi pêş ve bibin û binemayên metodî, hizrî û felsefeyên wî zanistî damezirînin karê rexneyî li cem wan diyarkirina yasayên edebî bû. Ew yasayên ku zimanê teksta edebî li formên dî yên bikarhînana zimanê cûda dike. Bolşevîkan di domahiyên salên bi bistan de ev qutabxane girt û dûmahîpêhînana guwaye bizavek bûrjûvaziyane ye piştî wî "Roman Çakopson" Rûsya hêla û çû li Çekoslovakya bi rêya qutabxana "helqeyî zimanasî Pirag" boçûnên formalîstên rûs geşepêkir û di gel binemayên zanistiyên sîmîlojiya têkel kir û bi vê çendê jî lêdaneweyeka nijyargeriyane ya îstîstatîka û kultur û zimanî dest pê kirin.

Nijyargerî:

Rihên nijyargerî ku di nav gelek kayeyên meirifî de ye, êk ji wan kayeyan zanista zimanî ye, bi taybetî karên zimanên zimanasî siwîsrî Ferdînand Dî Sosêr û karên formalîstên rûs, tikaye xwînerê hêja binêre jêderê serî Merîwan Wiraya Qan, felsefe û îslam, roşengerî û her wesa Fazil Omer, nijyargerî, ji weşanên êkitiya nivîserên kurd jimara 40, nijyargeriyeka boçûnên du Sosêriyan sebaret bi bo niyadên zimanî û çaweniya karkirina wan bûnyadan

veguhaste nav kayeyên diyên meirifî ku ji encama vê veguhastinê zanistê amajenasî "sîmotîk" çêbû. Di vê biwarî de Rolan Bart 1915-1980, rolek hêcgar giring dît ji veguhostina boçûnên du Sosêrî li ser bo nîdên zimanî, bo nav rehendên cidayên jiyana komelayetî, diyare jî di rewşenbiriya kurdî de "Merîwan Wîrya Qani" renge êkem kes bibe di dûmahiyên salên heştiyan de nijyargerî bi areste "guldimaniyekên" veguhaste nav rexneyiya edebî ya kurdî wek hewlek bo nûkirina rexneyî kurdî û bo rêbazek rexneyî taze.

Paş nijyargerî yan "helweşîngerî:

Heger nijyargerî geryanbe "gişt" yan "sercem" û xwerêxistina nawekî û cebir û yasayên giştgîr û bonyadan, eve hizra pişti nijyargerî li vê çendê di geryanê de bizane bonyad, mana, wêne û pênase çawa çendîn, ne çawa kar dikin. Ew pêşînane çine ku wan bonyad û manayan dixulqînin? Ne wek ew mekanîzmên ku kar pê dikin. Karê hizra helweşîngerî li ser wan satewaxteye berî ku bonyad çabin. Hel dide bizane çawa û bi çi şêwaz gotar çêdibin, şûnas di çi cûrên peywendiyan ji dayîk bidin, divê pirosesê de hizra pişti nijyargerî pêkola ravekirin û hilweşiyana bonyad, mana û pênaseyan dide. Dixwaze wan hurkite ve bo keresteyên xavên seretayî û peywendiyên hêz û desthelatî aşkere dike, ku mana û pênas û têrwaniyên bi arasteyek taybetî biriye û dibe. "7" tikaye binêre Merîwan Wirya Qani hij . bi berperê 165, bo wî jî gelek caran dibêjin hizra paş nijyargerî helweşîngerî, tev kîkiye ew ji bi haman şêwaz nijyargerî pişta xwe bi destkeftiyên giringtirîn felsefeyî yên nû yên zamnî germ dike. Êk ji bîrokeyên ciwan yê helweşîngerî ewe ku dibêjin: "her pênaseyek ji pênaseyan û her manayek ji manayan li ser bêdengkirina komeka pênase û nanayên dî çêbûye û li pêş vê bêdengkirinê sitratejiyeta taybeta desthelatî berheve, ku wan şêwe pênaseyan serwer dike û yên dî bê deng dike" Hizrên Mişêl Fiko 1926- 1984, Cak Dêrîda 1930-2004, nimûneyek berçav bo vî şêwazî nû ya hizrî ya felsefî. Hizra helweşîngerî rexneyeka tund bo dîtinên nijyargerên giştger, ew dibêjin bonyad xwedan lojiyek yekgirto nîne, giştgîr nîne, belkî bonyad ji nav de tijî cewazî û nakokiye, heger nijyargerî di nav zimanî de lojîkekî yekgirto û harmonî dibîne, deride dibe ku zman tijiye ji fewza û ladan û cewaziya. Bo wî jî ev hizre bi hizra cewazî û helweşîngerî hatiye niyasîn.

Eve û mirov dişê li ser her êk ji wan feylesof û metodên rexneyî gelek dirêj binivîse û pêde biçe, lê diyare bo karek weha "Heftenameya Evro" de ev çende bes.